
Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :410 nameronahi@gmail.com 11- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Rayber hê hene û xiyanet îro jî dewam dike

Helbestvan, şervan, berxwedêrê bi biryar Elîşêr û hevsera wî Zarîfe, beriya niha bi 81 salî weke îro, ji aliyê xiyaneta ku nokerî ji mêtingeriya Tirk re dikir hatin kuştin.
Yek ji kesayetên girîng ên birêxistinkirina berxwedanê Elîşêr û Zarîfe, ku piştî Komkujiya Qoçgiriyê hatin Dersimê, 16 salan li ber serweriya dewleta Tirk rabûn û 9'ê Tîrmeha 1937'an ketin kemîna xiyanetê ya 4 nokeran.

### NAMERDIYA XIYANETÊ

Dema ku Nûrî Dersîmî çû Helebê, Elîşêr û Zarîfe xwe li şikefteke li Çiyayê Tûjikê veşartibûn. Zeynel yek ji hevalên Seyîd Riza bû. Lê belê tevî çar hevalên xwe bi dewletê re hevkarî dikir. Zeynel û çar hevalên wî 9'ê Tîrmeha 1937'an qaşo Elîşêr û hevsera wî Zarîfe ziyaret kirin. Elîşêr û Zarîfe dema fêhm kirin ku ketine xefikê, bi çekê li ber xwe dan, lê di dawiya dawî de hatin kuştin. Zeynel ev rewş ji kurê birayê Seyîd Riza ji Rayber re ragihand. Kurê Seyîd Riza Îbrahîm, sala 1933'an di serdegirtina Sînê de hatibû kuştin. Rayber jî gumanbarê sereke yê kuştina Îbrahîm bû. Rayber zanîbû ku apê wî wê rojekê teqez hesab jê bipirse û nokerî ji dewletê re kir. Dewletê jî ev rewş bi dayina pere û pesindayinê bi kar anî û kesên weke Rayber û Zeynel kir sîxurê xwe.
Zeynel û Rayber serên jêkirî yên Elîşêr û Zarîfe tevî pirtûk, nivîs, helbest û eşyayên Elîşêr radestî Alpdogan Paşa kirin. Û xelata xwe girtin. Li gorî albay Nazmî Sevgen ku wêneyê serên jêkirî yên Elîşêr û Zarîfe kişand, bedenên bê serî nehatin veşartin û ji bo birizin li naverastê hatin hiştin. Lê belê çavkaniyên herêmî vê îdîayê red dikin û dibêjin ku bedena wan li cihekî nêzî şikefta Palaxineyê ku lê hatin kuştin, hatin veşartin. Zeynel Top dest ji nokeriya delwetê berda, lê Rayber dewam kir. Tevî vê yekê jî, sala 1938'an ji ber ku li ser pere li hev nekirin, hem ew bi xwe, hem jî kurên wî ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin.



Qelemşorê Tirk ê ku bi kujerên Elîşêr Zeynel û Rayber re wêne kişand, di beşa nivîsa xwe ya bi sernavê "Zeynel ê ku Erkanihaberî yê Dersimê Elîşêr kuşt, qala çi kir?" wiha dibêje: "Karên neyînî yên Elîşêr bi salan dewam kir. 9'ê Tîrmeha 1937'an, Elîşêr bi fîşeka dijminekî Dersîmî mir. Elîşêr ji bo Dersimiyan hêzeke rasteqîn bû. Ji bilî xwendin û nivîsandinê, bi mejî û zîrekiya xwe qebîle tevlî xwe dikir û ji bo avakirina Dersimeke xweser rê li ber mirina bi hezaran mirovên bêguneh vekir û hikumet bi salan pê re mijûl bû. Zeynel ê ku Elîşêr kuşt, yekî ji Dersimê bû. Bedena wî mîna peyker bû, pir wêrek bû. Piştî ku min ev agahî girt, yekser ez li Zeynel geriyam. Ev zilamê çiyê ku tam tîpekî Tirk e, cara yekê bû ku eynik didît, yekemcar bajar didît, yekemcar elektrîk didît."
Qelemşorê Tirk di beşeke din a rêze nivîsa xwe de dibêje, dema Zeynel hat Xarpêtê wî ji rayedaran destûr girtiye, ew biriye otelekê û pê re axiviye. Dibêje ku ji vî xayniyî re roja ku Elîşêr kuşt dewletê 100 zêr dayê û ji ber ku bawerî pê nedibû piştre hatiye îdamkirin û di dema îdamê de jî rûmeta xwe gelekî xistiye.

### ŞOPDARÊN ELÎŞÊR Û ZARÎFEYAN

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Kasim Engîn di salvegera şehadeta Elîşêr û Zarîfe de li malpera HPG'ê gotarek nivîsî û destnîşan kir, gerîlayên ku neviyên Elîşêr û Zarîfeyane îro ne tenê li Dersimê, li çar aliyên Kurdistanê li ber xwe didin.
Engîn di gotara xwe de wiha dibêje: "Her gerîla ji bo bibe Elîşêr û Zarîfe ji xwe re weke şerefekê dibînin ku li ser şopa wan bimeşin. Lê mixabin ên mîna Rayber hîn dijîn. Yên ku dixwazin bibin mîna Rayber, yên dixwazin Kurdan berdin hev û Kurdan pêşkêşî dewleteke dagirker bikin, hîn hene. Conversoyên bi vî rengî ji bo serê ciwanên Kurd bifiroşin dewleta faşîst tevdigerin. Mîna Rayberan dikevin kozikên leşkerên TC û wêneyan dikişînin. Ji bo bibin kujerê gelê xwe, mîna Enkîdûyan bi israr dixwazin serê Hûvavayan bên jêkirin. Ewladên azadîxwaz ên Kurdan, ewladên rasteqîn ên Elîşêr û Zarîfeyan îro li çiyayên Kurdistanê bi biryardarî li ber xwe didin. Wan pêşengên xwe Elîşêr û Zarîfe ji bîr nekirine. Jibîrkirin li aliyekî, gerîla ji bo berxwedana Elîşêr û Zarîfeyan bidomînin, li ser serê çiyê strana azadiyê bi dengekî hê xurt dibêjin."



# Her tişt ji bo jiyaneke azad e





Gerîlayên doktor gotin, "Em hêza xwe, moralê xwe û serketina karê xwe ji hevaltiya PKK'ê digirin."
Gerîlayên azadiya Kurdistanê di her warî de xwe birêxistin kirine û li çiyayên Kurdistanê bi jiyana xwe ya azad karê xwe bi rêk û pêk dikin. Li cem xebatên din Gerîlayên doktor ji bo hevalên xwe xebatên xizmeta tendurustiyê jî bi reve dibin.

### DI KAR DE HEVALTÎ HEYE

Doktor Delal Arîn diyar kir ku di vî karî de ew hesta hevaltiyê bi awayekî kûr hîs dikin û wiha got, "Hesta me pir cuda ye. Di vî karî de mirov zêdetir hevaltiyê hîs dike. Dilsoziyeke cuda di navbera me û hevalên nexweş de çêdike. Hêz û îradeyeke mezin ava dibe. Em hem gerîla ne hem şoreşger in û hem jî kedkarên tenduristiyê ne. Bi hev re temsîlkirina van nasnameyan ji bo min rûmeteke mezin e. Ji bo şoreşê bikaranîna van nasnameyan mirov xurttir dike. Dema mirov hêz û baweriya hevalên xwe dibînin, berpirsyariya mirovan mezintir dibe. Em jî dixwazin layiqê vê bin."

### HEVALTÎ NIRXA HERÎ MEZIN E

Doktor Birûsk Dogan jî da zanîn ku, tişta herî girîng ew e ku ew hevalên xwe rizgar bikin: "Dema di qadên şer de heval birîndar dibin, armanca me ya yekemîn ew e ku em di serî de hevalên xwe ji rîska şehadetê xilas bikin. Ji bo me hevaltî beriya her tiştî ye. Hevalekî me yê doktor navê xwe Xebat hebû. Ew heval ji bo hevalekî birîndar biparêze bi xwe şehîd bû. Ev der jî qada Zagrosê ye, qadeke ku tê de her tim şer diqewime. Karê me yê sereke dermankirina hevalên birîndar e. Li gorî şert û mercan em hevalên xweş tedawî dikin."

### KEDA ŞEHÎDAN HÊZÊ DIDE ME

Doktor Delîl Tolhildan bal kişand li ser keda Reberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, şehîdên tevgera azadiyê û wiha got; "Tevgera me bi keda Rêber APO û şehîdên me mezin bûye û hîmê xwe yê jiyanê jî ji keda wan digire. Ji ber vê yekê em hemû hêza xwe, vîna xwe ji vê rastiyê digirin. Hevalên me bi her qada jiyanê ve bi awayekî xurt girêdayî ne. Ji ber ku hevaltî ji bo hemû gerîlayan desteka herî mezin a manewî ye. Em jî di heman demê de ji hevalên xwe hêzê digirin û serketina me ya kar jî ji hevaltiyê tê."

### EM XIZMETA ŞOREŞÊ DIKIN

Doktor Aras Sîverek diyar kir ku, ew xizmeta şoreşê dikin û wiha got, "Armanca me ya yekemîn ew e ku em ji birînê hevalên xwe re bibin derman. Li qada Zagrosê ku her tim şer diqewime, em jî bi karê xwe destek didin hevalên xwe. Wekî gerîla em her tim têkoşîna xwe xurt dikin û ji bo jiyaneke azad dixebitin. Em ji vîna ku hevalên me nîşan didin hêzê digirin. Di navbera me û hevalên me de hesteke xurt çêdibe. Jiyaneke me ya kolektîf heye û em her tiştî par ve dikin."

### JI BO SIBEROJEKE AZAD

Gerîlaya doktor Devrîm Sozdar jî destnîşan kir ku karê wan ji bo siberojeke azad e û wiha got; "Tevgera me xwedî dîrokeke ji 40 salî ye. Bi derfetên gelekî biçûk xwe ava kiriye û niha jî xwedî gelek saziyan e. Caran em li nexwaşxanê hevalan tedawî dikin, caran diçin eniyan li gel hevalan, caran heval giran birîndar dibin, caran jî sivik. Armanca me ew e ku em hîn zêde ji bo tevgerê kar bikin. Têkoşînê hîn zêde xurt bikin. Ji bo jiyana azad, divê em hîn bêhtir kar bikin."...*ANF*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 410 11 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 10 leşkerên Tirk hatin kuştin



Çalakiyên gêrîlayên HPG'ê li bakur û başûrê Kurdistanê li dijî artêşa dagirker bê navber dewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir, li herêmên Bradost û Barzanê yên Başûrê Kurdistanê 4 leşker, li Bedlîsê jî 6 leşkerên Tirk di encama çalakiyên gerîla de hatin kuştin.***R-2***

# LI EFRÎNÊ XWEZA Û DÎROKÊ TUNE DIKIN

Dewleta Tirk ya ku bi tevî çeteyên xwe Efrîn dagirkiriye her roj li pêş çavên cîhanê kiryarên der mirovahî berdewam dike. Bi siyaseteke dijminane û nijadperest li Efrînê tevdigere û dixwaze çand û dîroka gelekî li wir tune bike.

### BERMAHIYÊN DÎROKÎ DIDIZIN

Li Efrînê dewleta Tirk a dagirker bi her awayî qirkirinê pêş dixe û dagirkeriyê kûr dike. Li cem kuştin, revandin, dizî û talanê, çand, xweza û dîroka herêmê jî tune dikin. Dagirker bermahiyên kevnar û şûnwarên gundê Sêwiya û deşta Kitixê yên girêdayî navçeya Mabeta didizin.

### DARÊN ZEYTÛNAN DIŞEWITÎNIN

Ji aliyê din ve darên zeytûnan jî ku sembola Efrînê ne û çavkaniya sereke ya ku gelê Efrînê pê debara jiyana xwe dike tên jê kirin û şewitandin. Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Geliyê Tîra yê li ser rêya navçeya Raco ya Efrînê 2500 darên zeytûnan yên gundê Edama şewitand. ***R-2***



## Em ê berxwedana xwe bidomînin



Berxwedana welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk li herêma Şehbayê bi cih bûn berdewam dike. Jinên Efrînê yên li kampa berxwedanê diyar kirin ku ew ê tevî hemû zehmetiyan jî têkoşîna xwe berdewam bikin da ku vegerin Efrînê. ***R-3***

## Pêdiviya herêmê bi xebatên mezin heye



Meclîsa Sivîl a Dêrazorê bi durûşmeya "Projeya Avakirina Hêzan a Meclîsa Sivîl a Dêrazorê" sêyemîn civîna xwe li dar xist. Di civînê de kar û barên meclîsê hat gotubêjkirin û di vê derbarê de nêrîn û pêşniyar hatin pêşkêşkirin. Di civînê de projeyên xebatên dema pêş hatin dest girtin. Hat diyar kirin ku pêdiviya herêmê bi projeyên xebatan heye. ***R-4***

## PKK nûnertiya gelên bindest dike




Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li ser êrîşên dewleta Tirk û daxuyaniyên Hikûmeta Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat gotin ku dewleta Tirk li dijî hemû Kurdan şer dike û got, " PKK nûnertiya hemû gelên bindest dike. Daxuyaniyên hikûmeta başûr êrîşên dewleta Tirk rewa dike." ***R-5***

## Ger bersivê nedin em ê biçin Bexdayê



Roja 8'ê Tîrmehê şandeyek ji nûnerên welatiyên Binarê Qendîlê serdana Parlamentoya Başûrê Kurdistanê kirin. Hevseroka şaredariya Binarê Qendîlê Gulale Osman diyar kir ku ew li benda bersiva Parlamentoya Başûrê Kurdistanêne û da zanîn ger helwestek a parlamentoyê nebe ewê serî li Bexdayê bidin. ***R-4***

## PKK'ê Başûrê Kurdistanê parast



Endamê Desteya Rêveber a Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan PADÊ Şêrzad Şemo diyar kir ku bêdengiya Kurdan û partiyên siyasî yên li hember dagirkeriya Tirk dibe sedem ku dewleta Tirk êrîşên xwe yên li dijî gelê Kurd berfireh bike û got, "PKK'ê ji Mexmûr heta Şengal û Kerkûkê hemû axa Başûrê Kurdistanê ji DAIŞ'ê parast." ***R-5***


## Komîn pirsgirêkan çareser dike




Komîna Şehîd Xebat ya li taxa Kornîş a Qamîşlo pirsgirêkên gel çareser dike û bi roleke sereke radibe. Hevserokên Komînê xebatên komînê nirxandin û diyar kirin ku tevî hemû astengî û kêmderfetiyan jî gel berê xwe didin komînê û komîn karê ku dive ser pêk tîne. ***R-6***

## Radestkirina Taşdemîr li DMME'yê ye

Parêzerên çalakvana jin a Kurd Gulîzar Taşdemîr a ku dewleta Norwec ew teslîmî Tirkiyê kir, serî li Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê dan. Parêzeran ji Daireya Koçberan daxwaz kirin ku biryara derveyî sînor paş de bikişînin, destûra rûniştinê ya Gulîzarê bê dayin. ***R-3***



## Wê bi vê pergalê jî faşîzm dewam bike




Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan ku beşdarî civîna Meclîsa Jinan ya partiyê bû diyar kir ku wê li Tirkiyê pergala nû jî pirsgirêkan çareser neke û wiha got, "Ev pergal dibêje ku wê faşîzm berdewam bike." Herwiha Pervîn ji bo ku di hilbijartinê de nûnertiya wekhev bi dest nexistine rexnedan da jinan. ***R-3***

## 7 partiyan hejmartina dengan boykot kirin

7 partiyên Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek dan û bi sedema hejmartina dengan bi awayeki şefaf nîne proseya hejmartina dengan a li Silêmaniyê boykot kirin. Berpirsyarê Ofîsa Hilbijartinan ya Tevgera Goran Belên Îsmaîl li ser navê 6 partiyan axivî û got; "Ev prose berdewamiya rêya sextekariyê ye." ***R-2***

## Erdogan wê êdî li gorî dilê xwe bike

Li Tirkiyê, piştî ku Serokê Giştî yê AKP'ê li meclîsê sond xwar, rejîm bi rengekî fermî guherî û sîstema yek zilamî dest pê kir. Çapemeniya Ewropayê cihekî fireh da vê mijarê û diyar kir ku rêjîma Erdogan xurt dibe û wê êdî karibe her tiştî li gor dilê xwe bike. ***R-5***

# Dagirkeriya Tirk qirkirinê kûr dike

***Li Efrînê dewleta Tirk a dagirker bi her awayî qirkirinê pêş dixe û dagirkeriyê kûr dike. Li cem kuştin, revandin, dizî û talanê, çand, xweza û dîroka herêmê jî tune dikin.***



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê komkujiya xweza û dîrokê dikin.
Li gorî agahiyên çavkaniyekê ji gundê Badîna yê navçeya Raco a Efrînê ji ANHA'yê re ragihandî, artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê bi armanca tunekirina dîrok û çanda herêmê, bermahiyên kevnar û şûnwarên gundê Sêwiya û deşta Kitixê yên girêdayî navçeya Mabeta didizin.
Heman çavkanî destnîşan kir ku leşkerên Tirk û çeteyên girêdayî wan beriya hefteyekê darên zeytûnan ên gundê Sêwiya li aliyê bakur û başûr ve hildikin û ji heman deveran gelek bermahiyên kevnar dizîn.
Li aliyê din artêşa Tirk û sê tabûrên çeteyan ên girêdayî wê (Tugaya El-Munteser Bîllah, Tugaya Mihemed El-Fatih û Ehfad El-Resûl) li deşta Kitixê li paş benzînxaneya Izzet dikolin û şûnwaran derdixînin û ber bi Tirkiyê ve dibin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê di meha borî de jî devera kevnar a MarMaron a li gundê Beradê ya navçeya Şêrewa kolandin û gelek bermahiyên kevnar jê dizîn.
Hêzên Tirk ên dagirker ku armanc dikin dîrok û çanda Efrînê tune bikin, gelek herêm û deverên pîroz yên girêdayî Êzidiyan hilweşandibûn.

**DARÊN ZETÛNAN DIŞEWITÎNIN**

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Geliyê Tîra yê li ser rêya navçeya Raco ya Efrînê darên zeytûnan di nava 2 donim erd de şewitand.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê tevî komkujî, guhertina demografiya herêmê, komkujiya xwezayê jî dike.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatine wergirtin, artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê derdora 2 hezar û 500 darên zeytûn, hinar û tirî yên şêniyên gundê Edama yê herêma Raco şewitandin.
Hate ragihandin ku çeteyan li gundê Eltaniye dest danîne ser zeviyê genim yê Abdulrehman Îsmaîl û Îsmaîl sirgunî Tirkiyê hatiye kirin, zeviyên wî jî hatine şewitandin.


## 10 leşkerên Tirk hatin kuştin

HPG'ê diyar kir, li herêmên Bradost û Barzanê yên Başûrê Kurdistanê 4 leşker, li Bedlîsê jî 6 leşkerên Tirk di encama çalakiyên gerîla de hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:
"Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me li dijî artêşa TC a dagirker çalakî li dar xistin. Li gorî vê yekê;
8'ê Tîrmehê saet 17.30'î, hêzên me li hêzên TC ên dagirker ên li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê xistin. Ji du baskan ve li çeperên dijmin hate xistin û leşkerekî dijmin hate kuştin.Hêzên me heman rojê saet 19:45'î li dijî artêşa TC a dagirker ku li ser mintiqeya Girê Xwedê ya herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê bi cih bûye, çalakiyek kirin. Derbên giran li çeperên dijmin ên li ser gir hatin reşandin û 3 leşkerên dijmin hatin kuştin.



7'ê Hezîranê saet 17'an, hêzên me li dijî qereqola Girê Şoxa yê navçeya Berwarî ya Sêrtê çalakiyek pêk anîn. Derbên giran li çeper û stargehên li qereqolê hatin xistin û 6 leşker hatin kuştin."


## Êrîş li balafirgeheke Sûriyê hate kirin



Li dijî baregeha T-4 a li Sûriyê êrîşeke hewayî hate kirin.
Rayedarên Şamê gotin, Îsraîl ji êrîşê berpirsyar e.
Li gorî ajansa nûçeyan a rejîma Sûriyê Sana, êvara Yekşemê li dijî baregeha T-4 a li herêma Hûmsê êrîş hate kirin. Çavkaniyên leşkerî yên Sûriyê gotin, "Sîstema me ya parastina hewayî bersiv da êrîşeke Îsraîlê û du fuzeyên berê wan li balafiregeha T-4 bû hate xistin."
Heman çavkaniyan diyar kirin ku derb li balafirekê jî hatiye xistin û balafirên din jî neçar man e ji qada hewayî ya Sûriyê derkevin.
Midûrê Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê Ramî Abdul Rahman ji AFP'ê re axivî û piştrast kir ku li balafirgeha T-4 û derdora wê bombe hatine barandin û dibe ku bombebaran li dijî şervanên Îranî yên li balafirgehê hatiye kirin.
Saziyê ragihand, artêşa Sûriyê, hêzên Îranî û Hîzbûllah a Lubnanê jî li heman baregehê bûn.

## Herî kêm 100 kes ji ber baranê mirin

Hejmara mirovên ji ber baranê li rojavayê Japonyayê mirin zêde bû. Rayedaran diyar kirin ku herî kêm 100 kes mirine.
Tîmên alîkariyê jî li taxên di nava heriyê de man û li binê malên hilweşiyayî li windahiyan geriyan.
Li bajarê Kûmano ku bi firçeya makyajê li cîhanê nav daye, gelek xanî di binê axê de man û bûn xirbe.
Li bajarê Kûrashîkî yê eyaleta Okayamayê gelek kes çûn ser banê xaniyên xwe û bi vî rengî hewl dan xwe ji lehiyê biparêzin. Tîmên alîkariyê ji ber zêdehiya ava lehiyê, roja Yekşemê li şûna botan bi keştiyan karê lêgerîn û rizgarkirinê kirin. Rêjeya avê roja Duşemê hinekî kêm bû. Tîmên alîkariyê wê karibin êdî bi peyatî jî karê xwe bikin.
Rojên În û Yekşemê, rêjeya ava



lehiyê ya li 93 cihên 14 eyaletan gihîşte asta herî bilind.
54 hezar arkuj, polîs, leşkerên Xweparastinê tevlî karê rizgarkirinê bûn. 5 milyon mirov ji herêmê hatin derxistin.
Felaketa vê dawiyê ya li Japonyayê bû yek ji felaketên herî giran ên dehan salên dawî. Li Hîroşîmayê sala 2014'an erd şemitî bû û 74 kes miribûn.
Mehên Tebax û Îlona 2011'an jî du bager rabûbûn û nêzî 100 kes miribûn.

## 7 partiyan hejmartina dengan boykot kirin

7 partiyên Başûrê Kurdistanê bi sedema hejmartina dengan bi awayeke şefaf nîne proseya hejmartina dengan a li parêzgeha Silêmaniyê boykot kirin.
Roja 9'ê Tîrmehê saet 11:00'an li ber Salona Aştî ya li Silêmaniyê Tevgera Goran, Komeleya Îslamî, Hevpeymaniya Ji bo Demokrasî û Dadperwerî, Yekgirtûya Îslamî, Hizba Komunîst, Hizba Sosyalîst û PDK'ê bi daxuyaniyeke çapemeniyê eşkere kirin ku ew bi sedema ne şefaf bûnê, proseya çavdêrîkirina hejmartina dengan ya li parêzgeha Silêmaniyê boykot dikin.
Di daxuyaniya çapemeniyê de berpirsyarê Ofîsa Hilbijartinan ya Tevgera Goran Belên Îsmaîl li ser navê 6 partiyan axivî û got; "Li gorî qanûna ku niha belgeya wê di destê me de ye, diviyabû mafê çavdêriya sindoqan hebuya. Lê rê nayê dayîn ku proseya hejmartina dengan a bi dest were çavdêrî kirin û astengî tê derxistin. Proseya hejmartina dengan ne şefafe û nahêlin em nêzîkî sindoqan bibin. Ev prose berdewamiya rêya sextekariyê ye. Ji bo vê me proseyê boykot kiriye."
Herwiha Îsmaîl got; "Divê piştî ku encamên hejmartina denga hatin ragihandin, divê ev jî were eşkere kirin ku ka çend sindoq hatine vekirin û li ser çi esasê hatine vekirin. Ji ber me daxwaza vekirina hemû sindoqan kiriye."

## Çalakiya mertalên zindî mehek tije kir



Li hemberî êrîşên dagirker ên dewleta Tirk ku ciwanan li Qendîlê çalakiya mertalên zindî dabû destpêkiri mehek li pey xwe hişt.
Bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Welatparêz û Jinên Ciwan ên Têkoşer bi slogana 'Serî li hemberî dagirkeriyê rake' li Qendîlê çalakiya mertalên zindî hatibû despêkirin. Mehek li ser vê çalakiyê derbas bû.
Di nava mehekê de ji bajarên cihê yên Başûrê Kurdistanê bi hezaran kes hatin serdana ciwanên çalakger. Gelek beşên civakî piştgirî dan çalakiya mertalên zindî ya ciwanan.
Ji ber ku mehek li ser çalakiyê derbas bû, ciwanan li Qendîlê daxuyanî dan çapemeniyê.
Serhildan Bamerdî daxuyanî xwend û got, "Çalakiya mertalên zindî ya ku me mehek berê dabû destpêkirin, bi hemû coşa xwe didome. Bi slogana 'Serî li hemberî dagirkeriyê rake' me ciwanan Başûrê Kurdistanê gelek mêvan pêşwazî kirin. Ji niha û şûnde jî em ê berxwedana xwe bidomînin."

## Cîhan zuha dibe û dibe çol



Servîsa zanistiyê ya Komîsyona Ewropayê diyar kir ku 75 ji sedî yê rûyê erdê bûye çol û xera bûye. Eger tedbîr neyên girtin ev rêje dibe ku sala 2050'î bibe 90 ji sedî.
Vê tespîta zanyara di versiyona nû ya atlasa çolbûnê ya cîhanê de cih girt. Atlas dawiya meha Hezîranê ji aliyê Navenda Lêkolîna Hevpar a Yekîtiya Ewropayê ve hate weşandin.
Li gorî vê yekê, her sal li cîhanê erdekî ji 4 milyon metreçargoşeyî xera dibe. Ev yek jî bi qasî nîvê erdê Yekîtiya Ewropayê ye. Hişkbûn û xerabûna axê bi taybetî li Afrîka û Asyayê dibe.
Zuhabûn û xerabûna axê, wê bandoreke giran li ser rekolteyê bike. Tê gotin, heta sala 2050'î wê 10 ji sedî rêjeya rekolteyê kêm bibe. Li gel vê yekê nifûsa li cîhanê zêde dibe û ev yek jî bandorê li çavkaniyên xwezayî dike.
Tê gotin ku tenê li Yekîtiya Ewropayê maliyeta xerabûna axê salane 10 milyar Euro ye.



# Marîn buye cihê gelek şaristaniyan

***Gundê Marînê malovanî ji gelek şaristaniyan re kiriye û dîroka wê zêde nayê zanîn. Li vî gundî 7 dêr hene û hinek dêr hê jî li ser pêya ne. Li ser vî gundê dîrokî gelek çîrok û mîtolojî tên gotin. Niha wek gund xuya dike lê diyar e ku bajarekî mezin bûye. Li vir mirov rastî şopên destpêka mirovahiyê tê.***

**Rohat ARARAT/ Mêrdîn**

Marîn niha gundekî ji 22 malan pêk tê ye. 15 km li bakurrojhilatê navçeya Nisêbîn ya Mêrdînê dikeve. Marînê yek ji bajarê herî kevn ê Mezopotamyayê ye. Bi demê re gelek caran dest guheriye. Marîna ku yek ji bajarê herî dîrokî û kevnare ye di roja meya îro de veguheriye şûnwarekî ji keviran ku bi piranî hatiye hilweşandin. Li bajarê ku xera bûye 7 dêr, serşok, keleh, qesr, zindan, saziyên desthilatdariyên berê yên wekî dadgehê û sûka bajêr hene.
Li vî bajarî Roma, Bîzans û Asûrî jiyane. Der barê dîroka vî bajarî û bermahiyên heyî de tu zanyareke tune ye. Bi hezaran şikeftên biçûk û mezin hene. Li ser dîwar û şikeftan hin nivîsên ku heta niha kêm ji wan ji aliyê gerokên hatine gund wergera wan hatiye kirin. Li ser şikeft, qesr, dêr, serşok û gelek berhemên din nivîs hene. Hin şikeft ji bo goran hatine bikaranîn lê ji aliyê welatiyan ve ev goran hatine hilweşandin. Ji ber ku Marîn di quntarê çiyayê Bagokê de ye, çem û kanî lê tune ne, bi tevahî teht û zinar e û ji bo pêdiviya avê jî bi sedan sarincên avê hatine çêkirin. Di heman demê de li ber her malê du û sê bîrên baranê ango sarinc hene. Dîsa çar sarincên mezin ku îhtimal e wekî bendav jî hatibe armanckirin ji bo avdana zeviyan û sewalan jî heye. Bi kevir û zinaran dîwar hatiye lêkirin û ser wan jî girtiye. Xuya dibe ku li vê derê beriya mirovahî derbasî avahiyan bibe di van şikeftan de mane û piştre jî ji xwe re avahî çêkirine. Heke dîroka wê bê lêkolînkirin dibe ku derkeve holê ku dîroka şikeftên wê ji yên Heskîfê kevintir be. Nayê zanîn lê dixuye ku mirov bi salên dirêj di van şikeftan de jiyane. Hin şikeft hene ku bi hezaran mirov tê de bi cih dibin û di hin şekeftê mezin de bi keviran navber hatiye dayîn. Yek ji serşoka em ketin hundirê wê diyare ku di encama kolana teht û çiyê de hatiye çêkrin ji sê-çar beşen li pêy hev pêk tê.

**KELEHA MARÎNÊ**

Her wiha keleha Marînê ku piraniya wê hilweşiyaye jî rêya ku diçe kelehê jî di encama kolana tehtan de pêlik hatine çêkirin. Keleha Marînê ku bi navê Merdîs jî tê nasîn di kîjan salê de ji aliyê kê ve hatiye çêkirin agahî û zanyariyek teqez tune ye lê belê ji avahîsasiya wê tê texmînkirin ku aydê Bîzansiyan e. Keleh li ser zinarekî bilind hatiye çêkirin û dîwarên kelehê bi qasî hezar û 500 metreyî dirêj e. Dîsa bi 12 kûleyan hatiye destekkirin ku piraniya wan niha xira bûne.

**TIM BUYE QADA ŞER**

Avahiyên gund jî hemû ji keviran hatine çêkirin û hemû jî avahiyên dîrokî ne. Marîn, gund an jî bajarê dîrokî wekî dîroka xwe ya berxwedêr û her tim bûye qada şer û bi dehan caran dest guheriye di salên dawî de ji salên 80 û vir ve 4 caran hatiye valakirin. Niştecihên gund jî li derdorê bi cih bûne û carek din vegeriyane gundên xwe. Ji xwe gelek avihiyên dîrokî ku keleh jî di nav de ye ji ber gule û topbarana hêzên dewleta tirk ve xera bûne.
Marîn gelekî bêxwedî hatiye hiştin. Şikeftên vê herêmê yên ku ji mirovahiyê re malovanî kirine niha ji aliyê gundiyan ve ji bo armancên cuda tê bikaranîn. Hem tê de dijîn, hem amûrên xwe têde diparêzin û hem jî sewalên xwe têde xwedî dikin. Şikeft havînê hênik û zivistanê jî germ in. Di kêliyên wê germa zêde ya ku em li gund bûn, em hînbûn ku piraniya welatiyan di şikeftan de radizên û ji germahiya havînê xwe diparêzin û bêhna xwe vedidin.



Heta niha li ser Marînê lêkolîneke zanistî nehatiye kirin û xebateke erdkolî ango arkelojîk nehatiye kirin. Lê li gorî welatiyên gund dibêjin di salên dawî de ji Ewropyê lêkolîner hatine û ji Dêr Xerabê nimûne girtine û li Ewropayê dane lêkolînkirin. Di encama lêkolînê de derketiye holê ku ev dêr beriya 2 hezar û 300 salî hatiye avakirin. Dîsa li ser hin malên ku nivîs hene bi rêya wergêr hatiye xuyakirin ku hin ji wan beriya niha bi hezar û 100 salî û hin ji wan jî 800 sal berê hatine avakirin. Di heman demê de li ser malekê jî ev nivîs dinivîse; "Ev mala gavanê gund e. Ji aliyê gundiyan ve her malekê kevirek aniye û xerca wê çê kiriye."


**7 DÊR LI MARÎNÊ HENE**

Heft dêrên li gund hene û hêj li ser pêyan in. Lê ji van dêran tenê navê Dêr Melk, Dêr Xerabê, Dêr Çapk, Dêr Seydk û Dêr Marg (Dêr Evgîn) ji aliyê gundiyan ve tê zanîn. Dêrên heyî li ser pêyan in. Lê xisarên mezin dîtine. Tenê yek ji van dêran Dêra Mor Evgîn di salên dawî de ji aliyê cemaeta asûrî-suryaniyan ve hatiye restorekirin û niha lê îbatet tê kirin. Dêra Mor Evgîn beriya niha bi hezar û 700 salî ji aliyê Rahîb Mor Evgîn û şagirtên wî ve hatiye avakirin. Perestgeh an jî Dêra Mor Evgîn li Quntarê Çiyayê Tûr Abîdîn e. Bi qasî 500 metroyî ji beriyê dûr e. Ev dêr jî ji şikeft û avahiyên hatine çêkirin pêk tê. Yek ji perestgeha herî dîrokî ya vê herêmê ye.

## *Govend danesîna çanda Netewane*







**Melek DEMÎRTAŞ**

Bi armanca rêxistin û komkirina komên govendê beriya mehekê dibin siya TEV-ÇAND de Komîna Govendê li bajarê Dirbesiyê hate avakirin. Ttêkîldarê mijare Rêvebira Komîna Govendê Kîwan Derwîş diyar kir ku govend Netewa Dîmokratîk ifade dike, ji bo wê jî bi armanca rêxistinkirina hemû komên govendê komîna Govendê hate avakirin."

**KOMÎN YEK JÎ BİRYARA KONFERANSÊ BÛ**

Endma Rêvebira Komîna Govendê Kîwan Derwîş ser armanc û çawaniya avakirin komîna govendê ev agahî dan: "Beriya du mehan ser asta Herêma Cizîrê li Nevenda Mihemed Şêxo ya Çand Û huerê 2.Konferansa Govendê hate li darxistin, yek ji biryarên konferansê ji bo rêixstinkiirna komên govendê avakirina komîna govendê bû. Her wiha ev komîn ser asta herêma Cizîrê hate avakirin û wekî rêvebiriê vê komînê ji 7 kesan ji hemû bajaran û yek ji netewê ereb jî cihê xwe di rêvebiriyê de digre."

**ARMANC KOMKİRİN Û RÊXİSTİNKİRİNA KOMANE**

Kîwan wiha dom kir: "Di Herêma Cizîrê de10 nevendên çand û hunerê hene û li hemû navenda komên govendê yên zarok û mezinan hene, lê jiber ku nesazkirin û lawaz xebat dihate meşandin. Bi mebesta komkirina hemû endam û komên dîlanan, da ku dibin siya komîna Govendê bi rêxistin xebat bê meşandin ku ev meheke Komîna Govendê li bajarê Dirbêsiyê hate avakirin."

**PÎLANSAZİYEK SER DU SLAN HEYE**

Kîwan di axaftina xwe de bal kişand ser pîlansaziya komînê û wiha got: "ji bo komînê pîlansaziyek ser du salan hate çêkirin, yek ji pîlansaziya komînê zêdekirin û guhertina rêbazê perwerdê, ji ber ku pêwîstiya bajaran bi mamosteyên govendê heye. Ji bo wêjî li akadimiya Hunerê ya Ş.Yekta ser 20 rojan perwedeya teorî û piratîkî girtî ji 16 endaman re ji Herêma Cizîrê û Kobanê re hate dayîn. Her wiha di pîlansaziyê de wekî komîna Govendê meteryalê govendê ji bo şagirtên akadimiya Hunerê ya Ş.Yekta beşê govendê amade bikin. Meteryal govendê wê lêkolîn ser Herêma koçerat, Koban û Efrîn be."

**PROJEYA GOVENDA NETEWA DEMOKRATÎK WÊ BÊ LİDARXİSTİN**

Kwan da zanîn ku Di demên pêşde wê şaxên xwe li bajaran vekin û wiha dom kir: "Projeyek govendê ku ji 100 endam ji hemû pêkhateyên di Bakurê Sûriyê cihê xwe di têde digre hebû, navê wê projeyê "Govenda Netewa Demokaratîk" hatibû amedekirin, her wiha hatiye tomarkirin jî. Lê jiber êrîşên dagirkeriya Tirkî û çeteyên wê ser Efrînê ev proje hate paşxistin, lê wê di demeke nêzde bê lidarxistin."

**ZİNDÎKİRİNA GOVENDÊN WİNDAYÎ**

Kîwan Derwîş da zanîn ku bi mebesta dawîkirina perwerdeya 20 rojan, li Navenda Mihemed Şêxo şahiyek govendê hate li darxistin. Û wiha bi dawî kir: "Di şahiyê de du govend hatin lidarxistin, yek mîna sênaryo ew 4 herêmên ku li akadimiyê ser perwerde dîtin kirin mîna sênaryo û yadin jî herêma amedê hate pêşkêşkirin. Dema govend tê gotin hersê beşan ve girêdide, jiber bi govendê re mûzîk û tevger mîna şano tê kirin. Aremanca avakirina Komîna Govendê Rêxistinkirn û govendên windayî jinûve zindî bikin, ji ber ku govend danîsîna çanda seren dike."

**GOVEND NASNMEYE ÇANDE**

Mihemed Mehmûd Ebas ji Serê Kaniyê yek ji endamên perwerde wiha nerînê xwe anî ziman: "Ev 7 salin ku endamê çand û hunerêdi beşê govendê de dixebitim, lê hin jiwan dîlana wate û dîrokan nezanîbû. Lê piştî dewreya ku me li akadimiya Hunerê dît, dîrok û wateya govendan naskir, ku govend wate, çand, nasname û dîroka gelan dide nasîn."

# Komîn pirsgirêkan çareser dike

**Komîna Şehîd Xebat ya li taxa Kornîş a Qamîşlo pirsgirêkên gel çareser dike û bi roleke sereke radibe. Hevserokên Komînê xebatên komînê nirxandin û diyar kirin ku tevî hemû astengî û kêmderfetiyan jî gel berê xwe didin komînê û komîn karê ku dive ser pêk tîne.**

**Gulbîn BOZO**

Komîna Şehîd Xebat ya li taxa Kornîş a Qamîşlo pirsgirêkên gel çareser dike.
Yek ji lingê sereke yê şoreşa Rojava jî komîn û meclîsên gel in. Civak li dora komînan tên cem hev, xwe perwerde dikin, nîqaş dikin û ji pirsgirêkên xwere çareseriyê dibînin.
Komîna Şehîd Xebat ya taxa Kornîş a Qamîşlo jî bi erka xwe radîbe û di warê çareserkirina pirsgirêkan û perwerde kirinê de roleke mezin dilîze.
Hevsrokên Komîna Şehîd Xebat xebatên komîna xwe nirxandin û diyar kirin ku tevî hemû astengî û kêmderfetiyan jî gel berê xwe didin komînê û komîn karê ku dive ser pêk tîne.
Hevserokê Komîna Şehîd Xebat Cewahir Ehmed diyar kir ku di destpêka avakirina komînê de wan hin astengî dîtin lê niha xebatên komînê heta astekê hatiye rûniştandin. Ehmed wiha axivî, “Erka komînê ya sereke xizmetê ji gel re bike. Roj bi roj girêdana gel bi komînê re zêde dibe. Em ji hevserokan zêdetir xwe weke xizmetkarê gel dibînin.”
Cewahir Ehmed îşaret bi astengiyên ku di karên komînê de derdikevin kir û wiha dewam kir, “Di destpêka avakirina komînê de zêde wate û girîngiya wê nedihat zanîn. Hinek kesan digotin ger ku ew tevlî komînê bibin weke ku tevlî partiyekê bibin. Wiha fêhm dikirin. Lê di rastiyê de komîn ya civakê ye. Hemû pêkhateyên civakê cihê xwe di komînê de digirin.”




Ehmed da zanîn ku weke rojane ew ji saet 8’ê sibê heta 2’yê ber êvarê li komînê ne û xebatên xwe berdewam dikin.
Ehmed her wiha anî ziman ku ew kar û barên xizmetguzarî û paqijiyê jî dikin û bi şaredariyê re dibin alîkar. Ehmed bal kişand li ser çareserkirina pirsgirêkan jî û ev tişt anî ziman, “Em ji pirsirêkên avê heta elektrîkê, pirsgirêkên malbatî li gor derfetên xwe çareser dikin. Di vê derbarê de û di hin mijarên de em deh rojan carekê civînan jî ji gel re lidardixin.”
Ehmed di dewam axaftina xwe de da zanîn ku 160 mal girêdayî komîna wan e û bi giştî 35 kes jî endamên komînê ne. Komîn li gor sîstema xwe ya navxweyî rojane karên xwe bi rêxistin dike û dimeşîne.
Hevserokê Komîna Şehîd Xebat Cewahir Ehmed di dawiya axaftina xwe de bang li welatiyan kir ku li komînê xwedî derkevin û ji bo pêşxistina karê komînê piştgiriyê bikin û erka dikeve ser wan bi cih bînin.
Ji aliyê din ve Hevseroka Komîna Şehîd Xebat Ibtîsam Xelîl jî li ser kar û barên komînê axivî û bal kişand li ser rola jiyan ya di nava komînê de. Ibtîsam Xelîl diyar kir ku di destpêkê de jin zêde tevlî xebatên komînê nedibûn û wiha got, “Lê piştî ku jin tevlî xebatên komînê bûn û gelek tişt naskirin hê zêde li xebatên komînê xwedî derketin.”
Ibtîsamê bal kişand li ser perwerdeyên komînê û wiha dewam kir, “Li komînê perwerde bi rêk û pêk dewam dikin. Welatî tevlî van perwerdeyan dibin. Ev perwerde bandoreke erênî jî dikin.”
Hevseroka Komîna Şehîd Xebat Ibtîsam Xelîl di dawiya axaftina xwe wiha got, “Di komînê de komîteyên jin bi erka xwe radibin. Her wiha komîte serdana malbatan dikin û bi taybet vê dawiyê serdana malbatên Efrînî dikin. Ji aliyê din ve bi pirsgirêkên jinan re jî mijûl dibin.”

## Cumlê-Reîs



Medeni FERHO

Bayê faşîzmê, li çar parçeyên Kurdistanê xerab dibizive.
Faşîma Turkî, bi navê “Serokatiya Tîpê Tirk”, dest pê kir; erkên îradî û dewletî teva di destê “Reîs Erdogan” de kom bûne. Îradeya faşîst ku, bi tecrîd û îzolekirina Birêz Ocalan, stratejiyên radîqal kirin pratîkê wê êrîşên xwe dijwar bike.
Cumhur-Reîs Erdogan, bû Cumle Reîs... Û weke her diktatorî, “nîgaregend”iya tiştên nînin, nebûne dike. Îradeya Kurdan şaredarî xesp kirin, zimanê Kurdan, medya Kurd jî qedexe kir. Bi fermana dawî rojnameya Kurd Welat jî girt. Şaredarî, saziyên kulturî û medya, çavkaniyên magnetîk yê Kurdan bûn, teva tune kirin.Piştî ku çavkaniyên magnetîk yên netewa Kurd tune kirin, faşîzma turkî, li Bakur, Başûr û Rojava çavkaniyên magnetîk yên dagirkeriyê ava kirin. Ji bo vê jî, stratejiyên herî radikal kirin pratîkê. Armanc, rê girtina li ber Şoreşa Kurdî ye. Di van stratejiyên radîkal de, Cumle-Reîs Erdogan ne tenê ye; hêzên global-komploger jî li gel wî ne.
Piştî hilbijartinên 24ê Hezîranê, demildest hilbijartinên herêmî kirin rojevê. Armanc, ji holê rakirina rexneyên dijwar yên li ser qeyum û xespkirina şaredariyan e. 24ê Hezîranê “cumle reîs”tî meşrû kir, bi hilbijartinên herêmî jî, dixwazin, hem çavkaniya magnetîk-îradeya Kurdan bi giştî tûne bikin, hem xespa şaredariyan meşrû bikin.
Sîstema diktatoriyal û gihiştina qonaxa îro, ne “aqil”ê Erdogan bi tenê ye; çavkaniyek global heye û gav bi gav dimeşê. Di vê riya gav bi gav û nerme de, Kurd hêdî hêdî li ber piyan diçin. Kurd çavkaniya Şoreşa Rojhilata Navîn in, mêjî li Imralî dibin tecrîda girande ye; Rojava, dibin dorpêçeke global û dagirkeriyê de ye... Emerîka û Rusya jî destekê didine dagirkeriyê. Başûrê Kurdistanê li ber çavên cîhanê tê dagir kirin, hikumeta Hewlêr û ya Baxdayê bêdeng in. Serokwezîrê Başûrê Kurdistanê ne hêzên dagirker, Gerila û PKKe wek dagirker bi nav kirin. Gerilayên PKKê, dema ku DAIŞê, bi fermana dewleta Tirk êrîşî Başûr kir, di eniya herî pêş de şer kirin, xwin dan, can dan.Mixabin, li Başûr, çavkaniya magnetîk ya “faşîzma turkî”, PDKe û desthilatdariya Hewlêrê ye. Ev sahih e. Lê, li Başûr magnetîzma neteweyî ya Kurd şiyar e, li dijî dagirkeriyê têkoşînê dike. Mertalên zindî, Eniya Neteweyî û meşa li 9 bajaran mînak in!...
Li Bakurê Kurdistanê, bi taybetî walî, dadgerî, burokrasî çavkaniyên megnatîk yên faşîzmê ne. Waliyên Tirk li Bakurê Kurdistanê, herêman qedexe dikin. Ev qedexe li dijî mirovan, li dijî pez û dewaran e. Kurdistan kirine zindanek dojehî, walî, burokrat, fermandarên Artêşa Tirk bûne zebanî. 11 bendavên li Bakurê Kurdistanê têne çêkirin, hem cografya, hem civaka Kurd parçe dikin.Artêşa Tirk, di operasyonan de daristanan dişewitîne. Geya, ax, kevir, heywan, kêzik, kurmik, beraz, hewa û av tê şewitandin. Çûk jî direvin. Ev jî çavkaniya herî dijwar ya magnetîk ya faşîzma turkî ye. Mixabin Ewropa jî çavkaniyeke magnetîk e. Li Elmanya, avêtin ser weşanxeya Kurdan, pirtûk, amurên çapkirinê desteser kirin, avêtin ser komeleyên Kurdan; li Norwecê siyasetmedareke Kurd radestî Tirkiyê kirin. Mînak zêde hene. Rojava, parçeyek ji Suriye ye, Suriye endamê Neteweyên Yekbûyî ye, Tirkiyê jî xaka Suriye dagir dike, demografiya Rojava diguhere; komên çete ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wek terorîst hatine erê kirin, li cihê Kurdan bi cih dike, sucê mirovahiyê dikin û NY bêdeng e. Ev teva didine xuya kirin ku, faşîzma turkî, ji gelek çavkaniyan tê xwedî kirin. Cumle-reîs Erdogan, di vê hîpotez û stratejiyên radiqal de, ne tenê ye. Cumle Reîs Erdogan, li Tirkiyê, hêza makro biryaran teva kiriye destên xwe. Vê êrîşên xwe dijwar bike.
Divê Kurd şiyar bin, rojeva Kurdan jî, ant-î teza faşîzma turkî ye.

## Zîndana zarokan veguherî navenda perwerdeya zarokan



Di encama êrîşên dagirkeriyê bi ser Kantona Efrînê de bi hezaran şagirt û xwendevanên Efînê ji perwerdeyê hatin qutkirin. Bi dehan dibistan jî hatin rûxandin. Li Şehbayî Komîteya Perwerdeya Civaka Demokrtîk KPC-Demokratîk xwe ji nû ve birêxistin kir û tevî herdu kampên Berxwedan û Serdem li tevahî navçe û gundên Şehbayê bi qasî 50 dibistanan vekir.
Yek ji wan deveran taxa Ehdas e. Avahiya dibistanê beriya 2011an weke Zîndana Zarokan “Sicin Elehdas” dihate naskirin. Di vê zîndanê de zarokên temen biçûk dihatin girtin. Gelek cureyên işkenciyan li wan dihate kirin. Di sala 2012an de rikberiya Sûriyê ku bi demê re veguri komên çete dest danî ser zîndanê. Zîndan di serdema çeteyan de weke navend û qerargeheke kuştinê dihate bikaranîn. Niha jî KPC-Demokratîk ew zîndana zarokan ji navendeke hebiskirinê veguherandiya navendeke fêrkirin û zanistê.
Derbarê vê mijarê de Endamê Rêveberiya Dibistana Ehdas Abdulrehman Sîdo ev nirxandin kir: Dewleta dagirker a Tirkiyê di serî de dibistan û avahiyên perwerdehiyê kirin hedefa balefir, tang û topên xwe. Armanca wê hilweşandina sîstema demokratîk a perwerdeyê bû. Sîdo derbarê avahiya dibistanê ku berê zîndana zarokan bû got: Berê di vê avahiyê de mejiyê zarokan dihate têkbirin û mirov li gorî daxwaza rejîman dihatin afirandin. Niha em li vê avahiyê li gorî zihniyeteke azad mirovan ava dikin. Li şûna hebiskirinê, em mirovan bi zanist û perwerdeyê ber bi jiyaneke azade ve difirînin.
Ji aliyê xwe ve mamoste Rojîn Çawîş got ku em li şûna işkence û zîndankirinê zarokan li vê navendê fêrî zimanê dayîk dikin. Derbarê sîstema perwerdê û zehmetiyan de Çawîş ev tişt anî ziman: Di dibistana Ehdas de ji refa yek heya refa 12 zêdeyî 150 şagirtan dixwînin. Di van refan de metiryalên zanist, wênexîzî, spor, metamatîk, çand û exlaq, jineolojî, zimanê Kurdî û Erebî tên dayîn. Mamosteya dibistana Ehdas dawiyê de got ku ew ji ber rewşa dagirkeriyê gelek êş û zehmetiya dikişînin. Lê tevî vê yekê jî ew ê bi şagirtên xwe re xwedî li zimanê dayîkê derkevin… ***Şîlan-Ikbal***

## Çemê Xabûr bêhna nexweş belav dike



Ji çemê Xabûr ê ku di bajarê Hesekê re diherike, ji ber ava kanalîzasyonê bêhna nexweş belav dibe. Şêniyên taxa Xiwêran ku li rex çem dimînin ji şaredariyê xwestin ku pirsgirêkê çareser bike.
Piştî ku hikûmeta AKP’ê herikîna ava çem rawestand. Ji ber ava kanalîzasyonê ji çem bêhna nexweş derdikeve.
Şêniyên taxa Xiwêran ku li nêzî çem dimînin, ji ber vê pirsgirêkê bi neyînî tesîr dibin û xwestin ku ev pirsgirêk bê çareserkirin.



# Em ê berxwedana xwe bidomînin

***Berxwedana welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk li herêma Şehbayê bi cih bûn berdewam dike. Jinên Efrînê yên li kampa berxwedanê diyar kirin ku ew ê tevî hemû zehmetiyan jî têkoşîna xwe berdewam bikin da ku vegerin Efrînê.***







Jinên Efrînê yên ku di kampa berxwedanê ya kantona Şehbayê de bi cih bûne û têkoşîna xwe dewam dikin, gotin: “Em tevî hemû zor û zehmetiyên jiyanê, berxwedana xwe kêlî bi kêlî dewam dikin. Em ê rojekê teqez vegerin ser axa xwe. Ji ber ku baweriya me bi şervanên me yên azadiyê heye.”
Di çarçoveya mijara berxwedana gelê Efrînê de li Kampa berxwedanê jinan nerînên xwe anîn ziman. Jina bi navê Nazliyê Mihemed axivî û got: “Dewleta tirk û hevkarên wê bi hovîtiya ku kirin ji Efrînê bi sed hezaran kes dan koçberkirin û bûn sedem ku jiyana xwe di bin çadiran de berdewam bikin. Lê dîsa tevî hemû zehmetiyan û astengiyên jiyanê ji bo ku em carek din vegerin Efrînê em ê têbikoşina dewam bikin.”Ji na bi navê Firyel Cimo jî bertek nîşanî dagirkirina Efrînê da û ev tişt got: “Erdogan û komên pê re bi êrîşên xwe nikarin îradeya Gelê Kurd bişkînin. Ji ber ku Gelê Kurd îradeya xwe ji fikir û felsefeya Rêber Apo digire. Em qebul nakin ku em di bin dagirkeriya dewleta tirk de bijîn. Em wek dayîk ji bo rizgarkirina Efrînê em ê xwe bikin top û di nav çeteyan de biteqîn. Bangawaziya min ji hemû Dewletên navnetewî re heye ku êdî bê dengiya xwe bidawî bikin û ji ber ku pêkanînên dewleta tirk ên li ser Efrînê mirovatî derbas kirine.”
Jina bi navê Zehira Salêh Ebdî jî bertek nîşanî dagirkirina Efrînê da û wiha got: “Tekoşîna gelê Efrînê ku li Şehba dide meşandin wê misogeriya rizgarkirina Efrînê bi xwe re bîne. Planên dewleta tirk û hevkarên wê li ser gelê kurd wê vala bên derxistin. Em ê bi hêza xwe û hêza şervanên xwe di demek nêz de vegerin Efrînê.”…***JINNEWS***

## Wê bi vê pergalê jî faşîzm dewam bike




Hevseroka HDP’ê Pervîn Buldan, ji ber ku di 24’ê Hîzranêde nûnertiya wekhev bi dest nexistin rexenedayîn da jinan.
Meclisa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), ji bo ku Hilbiajartinên 24’ê Hezîranê binirxîne, xwe ji bo serdema nû amade bikin û ji bo rêxistinkirina jinan niqaş bikin li navenda xwe ya giştî civîn li dar xist.
Axaftina vekirinê ya civînê ji aliyê Hevseroka HDP’ê Pervîn Buldan ve hat kirin. Pervînê hilbijartinên 24’ê Hezîranê jî bi bîr xistin û wiha got: “Ev bu hilbijartineke ku di serdemeke ne meşrû, di şert û mercên OHAL’ê de ku bi sedan kes di girtîgehan de ne pêk hat û HDP’ê di vê hilbijartinê de serkeftineke mezin bi dest xist. HDP bû partiya yekane ku bendava derbas kir.”
Pervînê ji jinên di girtîgehan de dimîn re jî spas kir, diyar kir ku wan di vê hilbijartinê de temsîliyeta wekhev ya jinê bi dest nexistiye û wiha got: “Me got ku me îmze avêt binê serkeftineke mezin lê em dibêjin ku ev serkeftin ji bo me ne bes e. Partiya ku herî zêde nûneritiya jinê lê heye HDP ye. Lê ji ber ku me nûnertiya wekhev bi dest nexist em rexnedayîna xwe didin. Li gel 67 parlamenterên mêr 26 parlamenterên jin ketin parlamentoyê. Em derketin rêjeya ji sedî 37’an. Lê em dizanin ku ev ne bes e. Ev nebesî wekî dersekê ye ji bo me ku em di serdema bê de vê çareser bikin.”
Pervîn li ser serdema nû ya piştî hilbijartinê jî nirxandin kir û wiha got: “Diyar e ku ew ê ev pergal jî tu pirsgirêkan çareser neke. Me bi caran di vî warî de hişyarî kir. Em dibêjin ku divê dest ji vê pergalê bê berdan û demildest derbasî pargala parlamenteriyê bibin. Ev pergal dibêje ku wê faşîzm berdewam bike.”

## Radestkirina Taşdemîr li DMME’yê ye



Parêzerên çalakvana jin a Kurd Gulîzar Taşdemîr a ku dewleta Norwec ew teslîmî Tirkiyê kir, serî li DMME’yê dan.
Çalakvana jin a Kurd Gulîzar Taşdemîr di 4’ê Tîrmehê de ji aliyê Norvecê ve teslîmî Tirkiyê hat kirin. Parêzerên Gulîzarê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (AÎHM) dan. Daxwaza îlticayê ya Gulîzarê ya ku di 2015’an da ji Norveçê kiribû, bi gotina “Tu ne siyasî ye, tu vegerî Tirkiyeyê jî tu talûke tuneye”, hat redkirin. Gulîzarê di 2’ê Tîrmehê de ji Almanyayê anîn Norveçê û di 4’ê Tîrmehê de tevî kelepçeyê teslîmî Tirkiyeyê hat kirin.
Ji bo Gulîzara ku tê texmînkirin ku niha li TEM’a Stenbolê tê girtin, parêzerên wê bi hinceta ku ev helwesta Norveçê li dijî peymanên navneteweyî ye, serî li DMME’yê ya Strasbourgê dan.
Parêzeran ji Daireya Koçberan daxwaz kirin ku biryara derveyî sînor paş de bikişînin, destûra rûniştinê ya Gulîzarê bê dayin.
Cepheya Jinê, Navenda Civaka Kurd a Demokratîk, Tora Rêxistinên Jinên Kurd, Ciwanên Azad nameyek hevpar şandin Wezareta Karê Derve yê Norveçê.
Di nameyê de helwesta Daireya Koçberan hat rexnekirin.
Hat daxwazkirin ku Wezareta Karê Derve bi nivîskî nameyê bibersivîne.

## Jineke 70 salî bi êşkenceyê hate qetilkirin



Hêzên dagirker li Efrînê navçeya Şêrawa pîrejinek bi êşkenceyê qetil kirin û hevserê wê jî revandin.
Li gorî agahiyên ji herêmê hatin wergirtin, çeteyên koma “El-Hemzat” ya girêdayî dewleta Tirk roja 7 Tîrmehê li gundê Berad ê navçeya Şêrawayê xwestin dest deynin ser milkên malbata welatiyê bi navê Hemdî Ebdo (70) û hevjîna wî Sultana Xelîl Naso (70).
Hat ragihandin dema ku malbat li hemberî wan senikinîn û qebûl nekirin ku dest deynin li ser milkên wan, çeteyan ew neçar kirin ku 250 hezar lîreyên Sûrî bidin.
Li gor heman çavkaniyê, çeteyên heman komê dîsa avêtin ser wê malê. Çeteyê bi navê Ebû Elî Heyanî jî bi awayekî hovane li Sultana Xelîl da, ta li ser hişê xwe çû û wefat kir. Her wiha hevserê wê Hemdî jî revndin û ew birin cihekî ne diyar û piştre dest danîn li ser mîlkên wan.

## Ji bo jinan dewreyên perwerdeyê destpê dikin



Yekîtiya Jinên Ciwan a herêma Tebqayê ji bo jinên ku ji mafê xwendinê bê par mane dewreyên perwerdeya xwendin û nivisandinê vedike.
Yekîtiya Jinên Ciwan a Tebqayê li ser daxwaza jinên herêmê ji bo jinên ku ji mafê xwendinê pê par mane, dewreyên perwerdeyê xwendin û nivîsandinê vedike. Perwerde wê li navenda ciwanan werin dayîn û qeydkirina navan wê destpê bike.
Yekîtiya Jinên Ciwan belavokên perwerdeyê li hemû sazî û navendên bajêr belav kir.Di dema dagirkeriya çeteyên DAIŞ’ê jinan herî zêde zilm dîtin. Jin ji hemû mafên xwe bi taybet ji xwendinê bê par man. Lê piştî rizgarkirina Tebqayê, bi taybet di aliyê perwerdê li herêmê gavên mezin hatin avêtin.

## TAJÊ Nêçîrvan şermezar kir

TAJÊ bi daxuyaniyekê bersiva gotinên Nêçîrvan Barzanî da û got; “Em daxuyaniya Neçîrvan Barzanî ya ku PKK’ê weke hêzeke dagirker bi nav kir, bi tundî şermezar dikin. Ev helwest û axaftin nîşaneya hevkariya bi dijminê gelê Kurd Erdogan re ye.”
Tevgera Azadiyê ya Jinên Êzîdxanê TAJÊ bi daxuyaniyekê ji ber ku PKK weke dagirker bi nav kiribû, Nêçîrvan Barzanî şermezar kir. TAJÊ di daxuyanî xwe de bal kişand ser pêkanînên dewleta Tirk û wiha got; “Hêzeke dagirker a welatiyên xwe dikujê qetil dike ye. Hêzeke dagirker ewe ku ji bo hebûna xwe li dijî mirovahiyê bêpîvan şerê mirovahiyê dike. Hêza dagirker Dewleta Tirk e. Hêza ku hat Êzidaxanê rizgar kir û parast li gel me pîroz e û li gel me ti car nabe hêzê dagirker. Dagirker dewleta Tirk e û hevkarên wê ne. “
Hêza ku hatin Şengalê HPG û YJA STAR axa Êzîdxanê rigarkirin û parastin. Niha ji Nêçîrvan Barzanî dibêje PKK hêzeke dagirker e. Ma gelo dema ferman çêbû ew li ku bûn? Kî gelê me yê Êzidî, ji destê DAIŞ’ê de hişt. Ma ne ew hêza PDK bû? Lê PKK’ê hat Şengalê em rizgarkirin.
Em ji Barzanî re dibêjin dev ji hevkarî ya bi dijminê gelê Kurd Erdogan û dewleta Tirk berde. Neyê lîstokên Erdogan. Ê ku hebûna gelê Kurdistanê biparêze wê PKK be, ne Erdogan be.”

# Pêdiviya herêmê bi xebatên mezin heye

*Meclîsa Sivîl a Dêrazorê bi durûşmeya "Projeya Avakirina Hêzan a Meclîsa Sivîl a Dêrazorê" sêyemîn civîna xwe li dar xist. Di civînê de kar û barên meclîsê hat gotubêjkirin û di vê derbarê de nêrîn û pêşniyar hatin pêşkêşkirin. Di civînê de projeyên xebatên dema pêş hatin dest girtin. Hat diyar kirin ku pêdiviya herêmê bi projeyên xebatan heye.*

Di bin durişmeya "Projeya avakirina hêzan a Meclîsa Sivîl a Dêrazorê" de, sêyemîn civîna Meclîsa Sivîl a Dêrazorê hate lidarxistin. Di civînê de pêdiviyên sereke û astengiyên li pêş komîteyên meclîsê û rêxistinên navnetewî û hundirîn, hatin gotûbêjkirin.
Di bin durişmeya "Projeya avakirina hêzan a Meclîsa Sivîl a Dêrazorê" de sêyemîn civîna Meclîsa Sivîl a Dêrazorê hate lidarxistin. Di civîna ku li hola konferansan a Meclîsê hate lidarxistin de, hemû endamên komîteyên xizmetguzarî, rêxistinên navnetewî û hundirîn ên li Bakurê Sûriyê dixebitin û nûnerên Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê û Hevserokê MSD`ê Riyad Dirar û Endamê Desteya Siyasî ya MSD`ê Hesen Elî Zohat û Endamên Meclîsa Sivîl û Zagonsaz ên Dêrazorê beşdar bûn.



Axaftina destpêkê ya civînê ji aliyê Hevserokê Meclîsa Sivîl a Dêrazorê Xesan El-Yûsif ve hate kirin. Yusif behsa girîngiya projeya demokratîk li Dêrazorê kir û destnîşan kir ku rizgarkirina herêmê û hevgirtina pêkhateyên herêmê dihêle bal cîhanê li ser vê herêmê be.
Hevserokê Komîteya Rêxistinên Mirovî û Karûbarên Civakî Tariq El-Raşid jî axivî û wiha got,"Ev herêma ku çend sale di nava şer de ye, em ê hewl bidin projeyên xwe yên xebatê pêş bixin û ji bo pêşerojê proje û plansaziyan derxînin. Pêdiviya herêmê bi xebatên mezin heye."
Paşê di civînê de nîqaş û pêşniyar hatin kirin. Di dawiyê de rewşa bajarê Dêrazorê û pêdiviyên welatiyan hat destgirtin û li ser rêbazên kar û koordîneya bi rêxistinan re hat nîqaş kirin.

## Ger bersivê nedin em ê biçin Bexdayê

Hevseroka şaredariya Binarê Qendîl diyar kir ku ew li benda bersiva Parlamentoya Herêma Kurdistanêne û destnîşan kir ku ger helwestek a parlamentoyê nebe ewê serî li Bexdayê bidin.




Roja 8'ê Tîrmehê şandeyek ji nûnerên welatiyên Binarê Qendîlê serdana Parlamentoya Başûrê Kurdistanê kirin. Şande ji aliyê Sekretera parlamentoyê ve hatibû pêşwazîkirin. Şandeya welatiyan daxwazên xwe radestî parlamentoyê kirin.
Li ser serdana parlamentoyê Hevseroka Şaredariya Binarê Qendîlê Gulale Osman axivî û got; "Bersivek a parlamentoyê çênebû, wê daxwazên me bigihînin hikûmetê ku li ser biaxivin. Di serdana me ya ji bo parlamentoyê de soza civînek taybet a li ser dagirkeriyê nehat dayîn. Tenê soza wê dan ku lijneyek ji endamên parlamentoyê, ji bo serdana gundên Binarê Qendîl bikin dan. Herwiha gotin wê ew lijne serdana cihên ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatîn bombebaran kirin jî bikin."
Hevseroka Şaredariya Binarê Qendîlê Gulale anî ziman ku wan dema berê de jî serdana parlamentoyê kiribûn, lê tu encamek bi dest nexistbûn. Gulale diyar kir ku ewê di daxwazên xwe de bi israr bin.
Di dawiyê de Gulale got; "Parlamentoya Başûrê Kurdistanê nûnertiya xelkê Başûrê Kurdistanê dike. Ji bo vê me daxwazên xwe pêşkêşî wan kir. Lê ger ti helwestek wan nebe, dibe ku em serdana Parlamentoya Iraq bikin."...*ROJNEWS*

## Li çar parçeyan em piştgiriya Kurdan dikin





Endamê Civata Niştîmanî yê Tevgera Goran Karwan Haşim eşkere kir ku li her çar parçeyên Kurdistanê li cem bidestxistina mafên gelê Kurd in.
Endamê Civata Niştîmanî yê Tevgera Goran Karwan Haşim derbarê gefên Wezîrê Karê Derve yê Tirk Mevlut Çavuşoglu ku dibêje, 'Rêveberiya Hewlêr û Bexda piştgiriya êrîşên me yên ser PKK'ê dikin, lê Tevgera Goran û YNK piştgiriya PKK'ê dikin û wê berdêla vê bidin' de axivî.
Endamê Civata Niştîmanî yê Tevgera Goran Karwan Haşim diyari kir ku li her çar parçeyên Kurdistanê piştgiriyê didin ku Kurd mafên xwe bi dest bixin. Karwan got, "Ti hêz nikare xewnên gelê Kurd ên li her çar parçeyên Kurdistanê têk bibe. Lewma em li her çar parçeyên Kurdistanê li gel çareseriya aştiyane ne."
Haşim wiha dewam kir, "Herî zû weke Tevgera Goran me gotinên Çavuşolgu red kir. Mixabin, pêwîst bû hikûmeta Herêma Kurdistanê bihata ser xetê. Ji ber ku dewleta Tirk dixwaze cudahiyê bixe di navbera Hewlêr û Silêmaniyê de. Niha qada hewayî ya Silêmaniyê rawestandiye. Em hikûmeta Herêma Kurdistanê û Tirkiyê berpirsê van karan dibînin. Em helwesta van herdu hikûmetan red dikin."
Endamê Civata Niştîmanî yê Tevgera Goran Karwan Haşim herî dawî bal kişand ser zextên dewleta Tirk ên li ser Herêma Kurdistanê û got; "Ev helwesta niha ya Tirkiye li hemberî Silêmaniyê dike, Serokwezîrê Herêmê û bi giştî hikûmeta Herêma Kurdistanê berpirsyare."...*ROJNEWS*

## Barzanî dagirkeriya Tirkiyê rewa dike



Partiya Kesk a Kurdistanê anî ziman ku daxuyaniyên Barzanî dagirkirina Tiriyê ya Başûrê Kurdistanê rewa dike.
Partiya Kesk a Kurdistanê têkildarî daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî û êrîşa dewleta Tirk a dagirker li ser Başûrê Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî da.
Daxuyanî wiha ye:
″ Sala 2014`an ji aliyê her kesî ve hat fêmkirin ku hêzên ku Kurdistan parçe û dagirkirine tu carî xêrê ji gelê Kurd re naxwazin. Dema ku çeteyên DAIŞ`ê êrîşî Başûrê Kurdistanê kirin hikûmeta herêmê alîkarî ji Tirkiyê xwest û Tirkiye nebû alîkar. Hêzên Parastina Gel û Hêzên Gerila derbasî Başûrê Kurdistanê bûn û li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kirin.
Gelê Kurd piştî vê yekê texmîn dikir ku hinek aliyên siyasî ji vê yekê tecrube bigrin. Lê belê Serokê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê têkildarî êrîşa dewleta Tirk li ser Başûrê Kurdistanê daxuyanî dide û vê êrîşê rewa dike.
Diviyabû Serokê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê dewleta Tirk a dagirker ji xaka xwe derxîne û Kongreya Netewî were lidarxistin lê belê berovajî vê yekê dike.
Em weke Partiya Kesk a Kurdistanê daxiyaniyên Nêçîrvan Barzanî weke rewakirina dagirkeriya Tirkiyê dibînin û bang li hemû aliyên Kurd dikin ku bi lez Kongreya Netewî lidar bixîn.

## Bi dagirkeran re dostanî nabe



Qasim ENGÎN

Dewleta Tirk a dagirker hebûna xwe li ser tunebûna Kurdan avakiriye. Mixabin hê jî wê feraseta xwe hewldide bidomîne.
Tevî ku ewqasî hewldanên Kurdan çêbûn da ku bikaribin pirsgirêkên heyî bi rê û rêbazên demokratîk ango bihevdîtin û bi lêhevkirinê çareser bikin, dewleta dagirker a Tirk carek din vegeriya moda xwe ya sedan salan. Bi gotinek din, vegeriya moda înkar û îmha kirina Kurdan.
Tevî ku dewleta dagirker a qirker hebûna xwe di tunebûyîna Kurdan de ango di tunekirina Kurdan de dibîne, hê jî hinek Kurd-çendî Kurdan ew jî cihê pirsê û gumanêye-xwe bi dewleta Tirk re aliqandin e û ji wan qut nabin.
Bêguman ti hêzên dagirker vekirî nabêjin ku ewê bixwazin welatê ku wan dagirkiriye tune bikin. Bêguman tu hêzên faşîzan nabêjin ku ew faşîst in û dij mirovahî ne.
Bêguman ti hêzên dagirker-herî zêde jî dagirkeriya dewleta Tirk-nabêje ku ew dixwazin Kurdan tune bikin.
Lê gundê xûyadike pêwîstî nîn e ku jê re rêber hebe.
Pêwîst nîne ku were gotin ku dewleta dagirker û qirker, armanca xwe tune kirina Kurdan e.
Pêwîst nîne ku were gotin di roja îro de hêza dagirker a Tirk dixwaze tevahî destkeftiyên Kurdan ji destê wan de derbixe û tevahî destkeftiyên wan tune bike.
Ma pêwîstî heye ku em bêjin ku gotinên dewleta dagirker a Tirk a ku dibêje hedefa me tenê PKK´ye, derew in.
Ma yên ku her roj qala pevajoya beriya Lozanê dikin ne ew in?
Ma yên ku her roj dibêjin sînorên me sînorên Mîsakî Mîllî ne, ne ew in?
Ma yên ku her roj dibêjin dem dema meye û li Heleb heyanî Musul-Kerkûk jî coxrafya me ye, ne ew in?
Heta yên ku dibêjin Selanîk jî, Batum jî ya me ye, ma ne ew in?
Ma pêwîst dike em bêjin yên ku Heleb û Musul-Kerkûk wek cihê bav û kalên xwe dibînin û dihasibînin, Kurdan ti caran nasnakin?
Ma rastî ne ev in?
Kî dikare bêje ku rastî ne ew in?
Bi gotinên şaîrê mezin yê Kurd Abdullah Pêşew eger em bêjin:

Xayîn in ewên dibêjin
"Dan û mûrî birayên hev in"

Xayîn in ewên dibêjin
"Xwîn û zîlo birayên hev in"

Xayîn in ewên dibêjin
"Masî û çengel
Dest û derzî
Werîs û gerden
Dûzan û mû birayên hev in"

Werin xelkno!
Ji nêçîr û birînê bipirsin
Bêjin Xwedê kî Xencer heye birîn derman bike?
Nêçîrvan heye, nêçîr nexwe?

De xelkno!
Ji kayê bipirsin
Tu car agirê sar dîtiye?

Ji hêlîna teyr bipirsin
Bi niyeta maçê tu car mar devê xwe kiriye wê?

De ji dara berrû bipirsin
Bivir dîtiye darbir nebe?

De ji kerekê jî bipirsin
Gur dîtiye kerxwur nebe?

Xayîn in ewên dibêjin
"Marê şîrînjehr jî heye"
Xayîn in ewên dibêjin
"Bivrê birê dar jî heye"



# PKK nûnertiya gelên bindest dike


*Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li ser êrîşên dewleta Tirk û daxuyaniyên Hikûmeta Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat gotin ku dewleta Tirk li dijî hemû Kurdan şer dike û got, " PKK nûnertiya hemû gelên bindest dike. Daxuyaniyên hikûmeta başûr êrîşên dewleta Tirk rewa dike."*

Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi sedan sale ji bo ku desthilatdariya xwe dewam bike, dijminahiya gelê bindest û azadîxwaz dike û got; "Daxuyaniyên hikûmeta Başûr êrîşan rewa dike."
Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li ser qirkirin, êrîşên dewleta Tirk û daxuyaniyên dawî yên Hikûmeta Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ger ji destê dewleta Tirk were wê nehêle gelê Kurd serê xwe rake, ev siyaseta wan ya bi salan e û dewam dike.
Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê di dewama daxuyaniya xwe ya nivîskî de wiha got; "Ev demeke dirêje dewlet aTirk bi rengekî veşartî êrîşê destkeftiyên gelê Kurd dike, bi rêya çeteyên DAIŞ'ê êrîş dikir. Alîkarî dide çeteyan û bi ser gelê mede dişîne. Piştî ku çeteyên DAIŞ'ê li hemberî hêzên Kurdan binketin, êdî dewleta Tirk bi xwe ket nava tevgerê. Piştî ku êrîşê Efrînê kir, derba herî mezin li wir xwar. Bi hemû hêza xwe nekarî li hemberî şervanan li ber xwe bide û bi binket."




Meclîsê di dewama daxuyanî de balkişan ser êrîşên dawî yên ser Başûrê Kurdistanê û daxuyaniyên Hikûmetê û got; "Dewleta Tirk ne tenê şerê PKK'ê dike, şerê tevahî gelê Kurd dike. Dewleta Tirk gelek caran diyarkiriye ku ew nahêlin gelê Kurd bigihin mafê xwe, lê tişta ku em îro pê di êşin nêzîkatiyên Hikûmeta Başûrê Kurdistanê ye. Daxuyaniyên li ser çapemeniyê tên kirin êrîşên dewleta Tirk rewa dikin. Hikûmeta Başûrê Kurdistanê jî weke dewleta Tirk li hemberî gelê Kurd sûc dike. Ev 40 sale PDK piştgiriya dijminên gelê Kurd dike. PDK'ê doza Kurd daye aliyekî, ji bo ku di dîrokê de PDK nekeve rûpelekî reş de divê nêzîkatiyên xwe sererast bikin."
Herî dawî Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê piştgiriya xwe ya ji bo gelê Başûrê Kurdistanê anî ziman û got; "Em wek Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê bi tu awayî wateyê nadin nêzîkatiyên PDK'ê û napejirînin. Em wek gelê Şengalê heta dawî piştgiriya gelê xwe yê li Başûrê Kurdistanê dikin. PKK temsîla hemû gelê bindest dike û ji bo wan têdikoşe. Em bang li hemû hêzên navnetewî dikin ku li hemberî vê rûreşiyê bêdeng nemînin. Ji ber ku dewleta Tirk sucê mirovahiyê dike."

## PKK'ê Başûrê Kurdistanê ji DAIŞ'ê parast



Şêrzad Şemo diyar kir ku PKK'ê hemû axa Başûrê Kurdistanê ji DAIŞ'ê parast û got, "Eger ne ji PKK'ê buya wê ji Şengal heya Mexmûr û Kerkûkê ketiba destê DAIŞ'ê. Tenê hêzeke pêşî li DAIŞ'ê girt û li dijî sekinî ".gerîlayên PKK'ê bûn
Endamê Desteya Rêveber a Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzidiyan PADÊ Şêrzad Şemo diyar kir ku bêdengiya Kurdan û partiyên siyasî yên li hember dagirkeriya Tirk dibe sedem ku dewleta Tirk êrîşên xwe yên li dijî gelê Kurd berfireh bike û got, "Tişta ku DAIŞ nekarî li Şengalê serbixe, niha Erdogan ".hewl dide bike
Şêrzad Şemo diyar kir ku dewleta Tirk bi derbaskirina sînoran xaka Iraqê binpê dike û rexne li Hikûmeta Iraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê kir ku li dijî van binpêkirin û êrîşên Tirkiyeyê nasekinin û got, "Bêdengiya hikûmeta navendî û ya herêmî dibe sedem ku deskeftiyên Kurd ji holê bên ".rakirin
Şêrzad Şemo ji partiyên Başûrê Kurdistanê xwest ku helwesteke hîn zelaltir bidin nîşan û bi rêya parlementoya Herêma Kurdistanê zext li Hikûmeta Federal a Iraqê bikin ku di demeke herî zûde pêşî li van êrîşên .dagirkeriyê bigirin
Endamê Desteya Rêveber a PADÊ Şêrzad Şemo diyar kir ku ev êrîşa niha tê gotin li dijî PKK'ê ye di rastiyê de li dijî tevahî destkeftiyên gelê Kurd de û wiha pêde çû; "Armanca Tirkiyê ne tenê dagirkirina Başûr an jî êrîşkirina ser PKK'ê ye. Armanc tevahî gelê Kurd e. Bi dehan salaye PKK li dijî dagirkeriya dewleta Tirk têdikoşe. Ger ne ji PKK'ê ba wê Kurd bi ti ".awayî negihiştiban mafên xwe

### PKK'Ê BAŞÛR PARAST

Şemo nerazîbûn nîşanî daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî yên li dijî PKK'ê da û got, "Tevî ku Erdogan hilbijartinên 24'ê Hezîranê bi sextekarî qezenc kir jî, Nêçîrvan Barzanî wî pîroz kir. Di van rojên dawî de jî daxuyaniyên ku dagirkeriya Tirk rewa dike dide û PKK ku ji bo azadiya gelên bindest têdikoşe bi dagirkeriyê tawanbar dike. PKK'ê hemû axa Başûrê Kurdistanê ji DAIŞ'ê parast. Eger ne ji PKK'ê baya wê ji Şengal heya Mexmûr û Kerkûkê ketiba destê DAIŞ'ê. Tenê hêzeke pêşî li DAIŞ'ê girt û li dijî sekinî gerîlayên PKK'ê bûn. Gerîlayan li Başûr şerê DAIŞ'ê kirin. Li kuderê metirsî hebe hêz ".şand wir
Endamê Desteya Rêveber a PADÊ Şêrzad Şemo diyar kir ku bêdengiya Kurdan li dijî dagirkeriyê dibe sedem ku DAIŞ careke din ji aliyê dewleta Tirk ve were xurtkirin û berê wan bidin herêmên ku Erdogan gef li wan dixwe û got, "Erdogan careke din hewl dide xwe bi rêya DAIŞ'ê bigihîne hinek herêman. Niha Erdogan raste rast gef li Şengalê dixwe û ew tiştên ku DAIŞ nekarî serbixe dixwaze niha bike."...*ROJNEWS*

## Erdogan wê êdî li gorî dilê xwe bike

Li Tirkiyê bi sondxwarina Erdogan re rejîm bi fermî guherî. Guhertina rejîmê û derxistina 19 hezar kesî ji kar, cihekî berfireh di .çapemeniya Ewropayê de girt
Li Tirkiyê, piştî ku Serokê Giştî yê AKP'ê li meclîsê sond xwar, rejîm bi rengekî fermî guherî. Sîstema hikumetê ku ji Serokwezîr û wezîran pêk tê wê qediya û li şûna wê Sîstema Hikumetê ya Serokkomariyê dest pê kir. Bi vî rengî rejîma yekzilamî li Tirkiyê .bi fermî dest bi kar kir
Beriya ku Erdogan li meclîsê sond bixwe, hikumeta Tirk "Biryarnameya Rewşa Awarte ya dawî" weşand. Bi rêya vê biryarnameyê re 18 hezar û 632 kes ji kar hatin avêtin, 12 komele, 3 rojname û qenaleke televîzyonê hatin girtin. Vê rewşê bi rengê "rejîma Erdogan xurt dibe" cihê xwe di çape- .meniya Ewropayê de girt

### KOMARA DERXISTINA JI KAR

Yek ji rojnameyên sereke yên Elmanyayê "Frankfûrter Allgemîne Zeîtûng" (FAZ) bi sernavê "Tirkiya Erdogan-Komara derxistina ji kar" cih da guhertinên ku Erdogan di nava rejîmê de kiriye. Di şîrove-nûçeya rojnameyê de ku bi navê nûçegihanê rojnameyê yê li Atînayê Mîchael Martens ve hate amadekirin, hate destnîşankirin ku piştî biryarnameya dawî wê Erdogan êdî karibe bi fermanê her guhertinê li gorî dilê .xwe bike
Deûtsche Welle jî bi sernavê "Erdogan sûltanê destpêkê yê Tirkiyeya nûjen e" cih da mijarê. Pisporên ku li ser mijarê ji Deûtsche Welle re axivîn diyar kirin ku sîstema serokatiyê ya li Tirkiyê nabe ku bi sîstemên li Fransa û DYA re bê nirxandin û erkên ketine destê Erdogan yek bi yek raxistin pêş .çavan

### QRALÊ ROJÊ YÊ TIRK

Yek ji rojnameyên sereke yên Awûstûryayê Dîe Presse jî li ser xurtbûna rejîma Erdogan û



biryarnameyên beriya wê hatin weşandin, nûçe-analîzek weşand. Rojnameyê gotina, "Qralê rojê" ku ji bo qralê Fransayê Lûdwîg ê 14. dihate gotin, ji bo Erdogan bi kar anî. Rojnameyê işaret bi bûyerên li Tirkiyê diqewimin kir û destnîşan kir ku Erdogan hemû erk xistiye nava destê xwe û bûye "qralê rojê .''yê Tirk

## Hikûmeta Sûriyê li kudera çareseriyê ye?



Zeki BEDRAN

Rêjîma Sûriyê komên çekdar yên li Deraa yê xistin bin kontrolê. Bi piştgiriya Rûsyayê hin herêm paqij kir. Yek ji pirsgirêkên bingehîn Îdlib e. Lê belê hebûna Tirkiyê, Efrîn jî di nav de rewşa herêmên ku dagir kiriye wê çi be, niha dernakeve pêş. Li hember rêjîmê muxalefeteke li ser hev û rêxistinkirî namîne. Şansê komên di bin kontrola Tirkiyê de ku bikaribin bi serê xwe biryarê bidin û bibin îrade zêde nema. Weke projeyeke Sûriya demokratîk QSD û rêveberiyên Rojava di rewşa niha de hatine asteng kirin. Tev li hevdîtinên Cenevrê nehatin kirin. Rûsyayê ragihand ev hêzên ku bakurê Sûriyê bi rêve dibin wê tev li pêvajoya Soçî bikin. Hevdîtin kirin. Komeke ku ji Kurd, Ereb, Suriyaniyan pêk dihat wê beşdarî Soçî kiribana. Lîsteya navan dan Rûsyayê. Lê piştî ku Rûsyayê bi Tirkiyê re li hev kir Kurd û hevkarên Kurdan beşdar nekir. Tevî ku beşdar nekir, agahdar nekir û daxuyanî neda. Weke ku vexwendinek çênebuye, lîsteya navan negirtine tevgeriyan. Di encama li hevkirinên veşartî bi Tirkiyê re ku hatin kirin de dagirkirina Efrînê hat rojevê.
Hikûmeta Sûriyê bi awayekî bi zanebûn nexwest hevdîtinan bi encam bike. Mijûlkirin û taktîka li demê belavkirinê pêk anî. Niha li qadê destên xwe xurt kiriye. Her wiha DYE û Ewropa dev ji helwesta ku Esed biçe, berdan. Ev jî ji bo Esed avantajê bi dest dixe. Ji ber wê ji polîtîkayên ku bi projeyên çareseriyê li ser masê rûnên, dûr in.
Bakurê Sûriyê xwe dikare bi rêve bibe. Alternatîfeke demokratîk ava kiriye û xistiye meriyetê. Ev yek ji bo hemû Sûriyê ji bo aştiya navxweyî pêk were weke projeyekê hatiye pêşkêşkirin. Lê rêjîma Baas di zihniyet û feraseta rêveberiyê de ti guhertin pêk neaniye. Weke berê dixwaze serweriya xwe li Sûriyê ava bike. Ger hêza rêjîma berê ya çareserkirina pirsgirêkan hebuya divê were pirskirin ev şerê navxweyî ji bo çi derket. Dest ji polîtîka û fikrên xwe yên ku Sûriye xerakirin, bernadin. Bi manevrayên siyasî û lîstikên propagandayê li Sûriyê çareseriyeke mayînde û aştiyeke navxweyî nayê ava kirin. Ji bo ku ev pêk were divê ji çareseriyeke demokratîk re vekirîbin. Divê hemû gel, bawerî û çand xwedî mafê kû bi hevre azad bijîn, bin. Ji bo vê divê destûreke bingehîn ya demokratîk were amadekirin. Divê li ser destûreke bingehîn ya bi vî rengî lihevkirinek pêk were.
Lê rêjîma Baas ji destûreke demokratîk û projeya çareseriyê dûr disekine. Li şûna vê yekê weke ku bi hêzên bakurê Sûriyê re hevdîtinan dikin, çareserî heye nîşan didin û hewl didin serê gel tevlihev bikin. Li naverastê nexşerêyek tune ye. Heyetên ku ji bo hevdîtinan hatine amadekirin tune ye. Lê weke ku heye hewl didin nîşan bidin. Di demên derbasbuyî de Erdogan jî bi PKK'ê re hevdîtinan dikir û weke ku çareserî wê bibe hewl dida nîşan bide. Lê ji van hevdîtinan encamek derneket. Lewre aliyên Tirk nexwest ku hêzeke navberkar bikeve dewrê. Her wiha di dema hevdîtinan de jî ti projeyeke çareseriyê pêşkêş nekir. Bi awayekî taktîkî nêzî hevdîtinan û pêvajoyê bû. Tenê bi mijûlkirin û sistkirina aliyê Kurd û bi amadekariyên leşkerî dem derbas kir. Rewşa niha ya rêjîma Sûriyê jî ji vê cudatir nîne. Nexşerêyeke ku pêşkêşî Kurd û Ereban kirine tune ye. Dibêjin "em hevdîtinan bikin, ger bi vê rêyê çareser nebe, bi darê zorê emê kontrolê ava bikin." Elimandinên wan ew in ku bi darê zorê gel bi xwe girêbidin. Tê fêhmkirin ku ji encamên şer û hilweşîndinên ku derketine holê encam dernexistine. Gelên Sûriyê û yên ku demokrasiyê dixwazin divê rê nedin van propagandayên bi armanca mijûlkirinê û ji rê derxistinê. Ger rêjîma Sûriyê dixwaze yekîtiya Sûriyê ava bibe û rewşa bêbawerî ya heyî bi dawî bibe berî her tiştî divê cidî be. Ji bo vê jî divê dest ji dij propaganda û faaliyetên îstixbaratî yên ku bi awayekî nepenî di nava gel de dike, berde. Aliyekî ku aşitiye dixwaze û ji hevdîtinan re amade ye ji bo çi bi rêbazên polîsiye û propagandayên ku seriyan tevlihev dikin bersivê dide.
Divê gel destûrê nede propagandyên rêjîma Baas yên ku seriyan tevlihev dikin. Divê li pratîkê û rewşa berbiçav binêre. Ger hikûmet çareseriyê dixwaze bila kerem bike ji bo çareseriê nêrîn û pêşniyazên xwe deyne holê. Wê kî navberkariyê bike bila bi wan re rûnê pirsgirêkan muzakere bike. Li naverastê tevî ku ti hevdîtin, hewldaneke çareseriyê û navberkar tune ye, weke ku çareserî heye nîşandan, ji derveyî propaganda û tevlihevkirina seriyan nayê ti wateyê.